# Ez Dixwazim Kurtajê Bibim




KÜRTAJ HAKKIM

KİH KADININ İNSAN HAKLARI DERNEĞİ

MOR ÇATI KADIN SIĞINAĞI VAKFI

Women on Web

## Kurtaj çi ye?

Gava jinek bêyî daxwaza xwe ducanî bimîne dikare tercih bike ku ducanîya xwe bi dawî bike. **Kurtaj, ne alternatîfek e ji bo rêbazên xweparastina ji ducanîyê,** ew rêbazek e ku di rewşên lezgîn de serî lê tê dayîn. Di kurtajê de, ducanîya ku nayê xwestin, bi rêbazên cerahî û medikal tê bidawîkirin. Bi qasî ku qanûnên welatên ku hûn li wê derê dijîn, destûrê bidin, yanê heta bi hefteya 10'an ya ducanîya we, hûn dikarin bi operasyona cerahî di nexweşxaneyan de ducanîya xwe bi dawî bikin. Rêxistina Tenduristîyê ya Dinyayê, di sala 2020'î de, xizmetên kurtajê yên çarçovefireh tev li **lîsta xwe ya xizmetên tenduristîyê yên bingehîn** kir. Xizmetên çarçovefireh ya ji bo kurtajê; parvekirina agahîyan ya der barê kurtajê de, kurtajkirin û xizmetên piştî kurtajkirinê li xwe digire.

Du rêbazên bingehîn yên kurtajê hene. Ya yekem, wekî **kurtaja cerahî** tê zanîn û bi gelemperî bi aspîrasyona vakumê, operasyon (emelîyat) tê kirin. Ev operasyon, digel anestezîyê tê kirin. Li welatê me, ji bo bidawîkirina ducanîyê, rêbaza cerahî, wekî rêbaza bingehîn tê bikaranîn.

Rêbaza duyem ya bingehîn jî, **kurtaja medîkal** e. Di kurtaja medîkal de, ducanî bêyî desttêkirina cerahî, bi rêya dermanan tê bidawîkirin. Dermanên ku madeyên Mifepriston û Mizoprostolê di wan de kartêk in û ji bo kurtajê tên bikaranîn, ji bo jiberçûna zarok leq lê dixe û wisa dike ku sedemên ducanîyê nemînin di laş de. Mifepriston û Mizoprostol, ji sala 2005'an û bi vir ve ye di nav lîsta dermanên bingehîn yên Rêxistina Tenduristîyê ya Dinyayê de cî digire. Digel vê jî, li welatê me, bidestxistina van dermanan gelek dijwar e û ji bo bikaranîna vê rêbazê jî derfet bisînorkirî ne. Hê li Tirkîyeyê rusxet ji bo Mifepristonê nehatiye dayîn û Mizoprostol jî tenê di dermanxane û nexweşxaneyan de peyde dibe.

# Mafek e ku mirov ji ducanîmanê netirse û têkilîya zayendî dayne!

Ducanîyên ku nayên xwestin, tevî ku dikare ji ber têkilîyên zayendî yên bêparastinê çêbibe jî, dibe ku ji ber ku tu rêbaza kontrolkirina zarokanînê ji % 100 naparêze jî, ducanî çêbibe. Mafek e ku mirov ji ducanîmanê netirse û têkilîya zayendî dayne! Mafê her jinekê heye ku ew bi xwe biryarê bigire ka ew ê çend zarokan bîne an jî ka ew ê zarokan bîne an jî neyîne û dema xwe ya zarokanînê dîyar bike.



## Rêbazên ku Pêşî Li Ducanîmanê Digirin

Ji bo ku jinek ji ducanîmanê netirse û têkilîya zayendî dayne û pîlan bike ka ew ê kîngê û çend zarokan bîne, rêbazên ku pêşî li ducanîmanê digirin, giring in. Jin dikarin bi rê û rêbazên wekî; hebên ku pêşî li duncanîmanê digirin, amrazên ku dixin nav malzarokê, derzîyên ku pêşî li ducanîmanê digirin, şiva binçerm, xelekên vajînal, kondoma jinan û girêdana tûpan, xwe ji ducanîmanê biparêzin. **Xweparastina ji ducanîmanê ne tenê peywira jinan e.** Mêr jî dikarin prezervatîfê bi kar bînin û vazektomîyê bikin û pêşî li ducanîmanê bigirin. Prezervatîf, di heman demê de, rêbazek e ku pêşî lê digire da ku bi rêya têkilîya zayendî enfeksîyon tênegerin. Ji bo ku hûn karibin der heqê rêbazên ku pêşî li ducanîmanê digirin de agahîyan bigirin, hûn dikarin serî li doxtora an jî doxtorê xwe yê malbatê bidin.

## Heba Dotira Rojê

Gava şika we çêbibe ku hûn ê ducanî bimînin, hûn dikarin heba dotira rojê bi kar bînin. Gava hûn bêparastin têkilîya zayendî daynin an jî şika we hebe ku hûn ê ducanî bimînin, hûn dikarin piştî danîna têkilîya zayendî, heta 120 saetan, van heban bixwin. Heba dotira rojê, ne alternatîfek e ji bo rêbazên xweparastina ji ducanîyê; ew rêbazek e ku mirov di rewşên lezgîn de serî lê didiyê.

## Mafên Min yên Kurtajkirinê Çi Ne?

Li gorî Der Heqê Qanûna Pîlankirina Gelheyê ya Bi Hejmara 2827'an[1], **li Tirkîyeyê, bêyî ku em sedemek an jî hinceteke tenduristîyê bêjin, heqê me heye ku em ducanîbûna xwe ya heta bi 10 hefteyan çûyî, bi dawî bikin.** Em dikarin vî heqê xwe di hemû nexweşxaneyên taybet û di yên dewletê de bi kar bînin.

1 Ji bo ku hûn der heqê mafê me yê kurtajê yê di qanûnan de xwe bigihînin agahîyên bi hûrgilî, hûn dikarin li rûpela me ya https://kurtajhakkim.org/yasalarda-kurtaj-hakkimiz/ binêrin.)

Gava hûn çûn nexweşxaneyan, divê doxtor, bêyî ku we bidarizîne, biryara we ya bidawîkirina ducanîyê guhdarî bike û der heqê kurtajkirinê de agahîyan bide we. Ji ber ku kurtajkirin operasyoneke wisa ye ku dema wê ya qanûnî heye û divê doxtor, li gorî biryara we bilez tevbigere û roja operasyonê ji bo we terxan û dîyar bike.

Heke hûn zewicandî bin, kurtaj bi destûra mêr e. Lê belê, heke ducanîbûn, bi awayekî fizîkî û derûnî we dixe nav talûkeyê, divê doxtor ji bo xweşî û tenduristîya we tevbigere û bêyî ku li benda destûra mêr bimîne, operasyonê bi cî bîne.

Dibe ku ji ber ku me rêbazên ku pêşî li ducanîyê digirin bi cî neanîne an jî ji bo ku em wan rêbazan bi cî neyînin, hatibin berbendkirin, loma ducanîya ku em naxwazin çêbûbe. Em dikarin ji doxtoran bixwazin ku der heqê rêbazên pêşîlêgirtina ducanîyê de agahîyan bidin me. Heke partner/mêr nehêle ku em karibin rêbazên pêşîlêgirtina ducanîyê bi kar bînin, ji bo ku em piştgirîyê hildin, em dikarin biçin cem pisporê an jî pispora xizmeta sosyal ya nexweşxaneyê an jî em dikarin serî li rêxistinên jinan bidin.

Heke ducanî, ji alî tenduristîya we an jî ji alî tenduristîya zarokên ku hûn ê bînin ve talûkeyeke giring çêbike, bêyî ku hûn bala xwe bidin sînorê demê, **heke ducanî ji ber tecawizê çêbûbe jî, heta bi 20 hefteyan jî, kurtaj tê kirin.** Doxtor bêgav in, berîya ku ducanîya we bi dawî bikin, an jî heke ne gengaz be tavilê agahî bidin, divê di nava 24 saetên piştî kurtajkirinê de, nasnameya we, operasyona ku hatiye kirin û sedem û hincetên operasyonê, li bajaran bi gerînendetîya tendûristîyê û gerînendetîya alîkarîya sosyal, li bajarokan jî bi doxtorîyên hikûmetê bidin zanîn.

Heke temenê we ji 18 salî biçûktir be, ji bo ku ducanî were bidawîkirin, destûra dêûbavê (welîyê) we hewce ye. Hûn dikarin bi dêûbavên xwe ku hûn bi wan bawer in, biçin û ducanîyê bi dawî bikin.


HASTANE

# Mafê Min yê Kurtajkirinê Tê Berbendkirin

Her çi qas mafê kurtajkirinê bi Qanûna Bi Hejmara 2827'an ya Der Heqê Pîlankirina Gelheyê De hatibe misogerkirin jî, di pêkanînê de em rastî gelek berbendkirinan tên. Dibe ku gava hûn çûn nexweşxaneyan, agahîyên şaş bidin we û ji we re bêjin; kurtajkirin qedexe ye an jî tenê heta 8 hefteyan dikare were kirin an jî li nexweşxaneyê amrazên hewce yên kurtajkirinê peyde nabin.

**Gava tiştekî wisa li we qewimî, hûn dikarin rêyên li jêr bikudînin:**

Kurtajkirin mafê we yê qanûnî ye. **Hûn dikarin bi dil û daxwaza xwe, bêyî ku hincetekê bêjin, ducanîya xwe ya heta bi 10 hefteyan bi dawî bikin.** Gava agahîyeke berevajîya vê agahîyê ji we re were dayîn, hûn dikarin vê agahîyê bi awayekî nivîskî ji wan bixwazin; gava ew nexwazin agahîya nivîskî bidin we, hûn dikarin wê agahîya şaş di daxwaznameya xwe de binivîsin û daxwaznameya xwe, ya ku we ji nexweşxaneyê re nivîsîye û we li ser mijarê ji wan xwestiye ku sedemên xwe bêjin, bidin nexweşxaneyê, bidin Gerînendetîyê Tenduristîyê yên Bajaran û bidin CİMER'ê. Heke di vê demê de, wext bi ser ducanîya we bikeve, hûn dikarin ji bo piştgirîhildanê serî li rêxistinên jinan bidin.

Kurtajkirin, operasyoneke sivik e ku her nexweşxane dikare wê bi cî bîne. Di rêziknameyê de dinivîse; pisporên zarokanînê û yên nexweşîyên jinan, li nexweşxaneyên ku lê dixebitin, doxtorên pratîsyen jî, di sazîyên tenduristîyê de û bi rêbaza vakumê, dikarin ducanîyê bi dawî bikin. Heke ji bo bidawîkirina ducanîyê anestezî hewce bike, ew jî dikare di sazîyên tenduristîyê yên ku anestezî lê çêdibe, were bicîanîn. Ji ber ku di her nexweşxaneyê de mercên kurtajkirinê hene, **gava nexweşxane bêje, amraz û mercên hewce tunene di nexweşxaneyê wan de, ev yek dibe şaşagahdarkirin.** Heke tiştekî wisa li we biqewime, hûn dikarin bi serbijîşk re biaxivin, ji wan bixwazin ku ew bersiveke nivîskî bidin we; û heke nexwazin bersiva nivîskî bidin we, hûn dikarin bersiva

wan ya bi devkî bi nivîskî di daxwaznameya xwe de binivîsin û ji nexweşxaneyê bixwazin ku sedemên xwe ji we re bêjin û rave bikin. Heke rewşeke wisa li we biqewime, nexweşxane bêgav e ku we bişîne nexweşxaneyeke din. Heke ev rê jî neyê bicîanîn, hûn dikarin vê rewşê jî di daxwaznameya xwe de binivîsin. Hûn dikarin daxwaznameya ku we mexdûrîyeta xwe tê de gotiye û we der heqê nexweşxaneyên ku kurtajê dikin de agahî xwestiye, derpêşî Gerînendetîya Tenduristîyê ya Bajêr bikin. Heke di vê demê de, wext bi ser ducanîya we bikeve, hûn dikarin ji bo piştgirîhildanê serî li rêxistinên jinan bidin.

## Ez nikarim nexweşxaneyekê peyde bikim da ku kurtajê bikim

Ji bo ku hûn hîn bibin ka li bajarê ku hûn lê dijîn, di kîjan nexweşxaneyê de kurtaj tê kirin, hûn dikarin bi awayekî nivîskî serî li Gerînendetîya Tenduristîyê ya Bajêr û serî li CİMER'ê bidin. Wekî din jî, heke wext bi ser ducanîya we bikeve, hûn dikarin ji bo piştgirîhildanê serî li rêxistinên jinan bidin.

**Rêxistinên Jinan**

**Rêxistinên Tenduristîyê**

**Gerînendetîyên Tenduristîyê yên Bajêr**





KÜRTAJ HAKKIM

kurtajhakkim.org